Mifayen werzia bi rêveçonê

Berhevkirin: Fehîma Îbrahîm

Dê çewa mifay ji werzişa bi rêveçonê wergirin?

Gelek pirtûk û vekolîn yên hatîne belavkirin, li dor giringiya werzişê di saxlemiya leşê mirovî da, di hindek vekolînên zanistî de ya hatiye xuyakirin ku rêveçon bergiriya leşî dijî êşanan bi hêz di êxe.

Her wesa xuya diket ku rêveçon dê karê zevleka bi hêztir êxit û şiyanên wê bo embarkirina kerestê xwarinê ku di demê pêdivî de bi kar bîne zêde dike.

Her wisa herdu sîhên mirovî fireh dibin, xwîn bi şêweyekê baştir di hemî demarên leşê mirovî de digere, ku mirov ji gelek nexweşiyan dihête parastin.

Rêveçon, mejiyê mirovî paqij dike û harîkariya mirovî di bênvedana mejî û leşî de dike. Awîzê kodemar û zevlekan bi hêz di êxe ku mirov bi sanahî dişêt biryarên dirust bide.

Ya dirust ewe di demê rêveçonê de, sîngê mirovî û henasekirin ya normal be û pêngavên fireh pavêjin, divêt xwe ji dengên bilind û nexweş û ronahiyên dijwar dûr bêxin.